

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

*Xebat ji bo* :
*** Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.**
*** Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.**
*** Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.**



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên* Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

*Hejmar (110)* *Sal 20 Gulan 2015z - 2627k* *Buha (50)L.S*


# ENKSê.. Rexne û lixweveger!?

■ **Desteya sernivîser**


**L**i ber bilindbûna dengê tevgerana gelê Sûryê, Encûmena Niştimanî ya Kurd li Sûryê li dawiya sala 2011ê hate damezrandin. Girêdana kongireke netewî kurdî û avakirina lêvegereke siyasî ji kurdên Sûryê re, daxwaza gelê me ya kevin, rewa û pir pêwîst bû. Em zêde nebêjin, lê ew ji salên nodî de ji sedsala borî, ji Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd re armanceke sereke bû. Loma jî rola PYDKs, ji gava destpêkê de di avakirina ENKSê de çalak û balkêş bû.

Dema ku ENKSê hate avakirin, û hemî partiyên tevgera kurd û pêkhatiyên civakê lê beşdar bûn, hêviyên mezin li ba gelê me çê bûn, xelkê me li dora wê civiya û mîna nûnerê xwe yê siyasî pejirand. ............2

# Sûryê û Tûnêla Tarî..!!

■ **Rozad Elî**

**D**i meha Nîsanê û Gulanê de, guhertinên (serbazî yên) mezin di warê legerî de li Sûriyê çê bûn. Li Başûr, bajarokê Busra El Şam û Dergeha (Nasîf) Nesîb bi Urdinê re ji hêla çekdarên rikberê ve hatin desteserkirin. Li Bakur jî, bajarê Idilibê, wekî navenda parêzgehê ye û bajarê Cisir Şuxrê jî, ji hêla hêzên rikberê ji destê hêzên sazûmanê hatin derxistin. ..........4



Bajarê Şamê "kevin û nuh"

## AHENGÊN 15ê Gulanê

## Roja Cejna Zimanê Kurdî

***Ahenga Cejnê Li Bajarê Efrînê:***

**D**i roja 15.5.2015an de, bi boneya Cejna Zimanê Kurdî, hejmarek ji mamoste ................7

## Li Navenda Partiya Yekîtî - Elwehdê li Efrînê

# Konfiranseke Rojnamevanî

**L**i navenda partiyê li bajarê Efrînê, li roja 30 meha Gulanê, Partiya Yekîtî ya Demoqrat A Kurd li Sûryê konfiranseke rojnamevanî li derbarê pirojeya xwe ya siyasî ya bi navnîşana ((Projeya nêrîneké, ji bo lihevkirina nofên rikberiya niştimanî û yekirina rêza kurdî li Sûryê)) li dar xist.

Di pirêskonfiransê de, peyamnrên rojnameyên El Wehdê, Ronahî, Newroz, malperên Êlêktronî û Ajansa ANHA amade bûn. ..........6

Nêrîna Azad

# Pirojeya Nêrînekê

## Ji bo lihevhatina baskên rikberiya niştimanî û rêkeftina wan û yekrêziya kurdî li Sûryê

▪ **Mihemed Qere Hesen**

Gava geleşe û asteng di welatekî de mezin dibin, vê re êş, derd û zordarî jî mezin dibin. Hiş û dîtinên mirov dûman digirin, şaş dibin, zû zû… …………

Di bin navnîşana jorîn de, Partiya Yekîtî ya Demqrat a Kurd li Sûryê (PYDKS) pirojeyek ragihand. Di rojên Sûryê wiha reş û tarî de, ku çareserî ne barçav in, tiştek pir baş e ku xêrxwazên vî welatî hîn hene û bi vekirina girêkên kilîtkirî diramin û çareseriyan jê re pêşniyar dikin. PYDKSê yek ji wan xêrxwaz û destsipî ne ku pirojeyeke lihevkirinê pêşniyaz dike. Lê pişt ku min ew piroje xwend, min xwast hinek têbînan li ser bidim:

A- Di movika rewşa Sûrî de hatibû, ku rêjîm di ber hilweşandin, kuştin, penaberiya li derve û hundir û tevahiya bobelata Sûryê de berpirsyar e, û hîn jî li serê xwe niştiye û dibîne ku çareya leşkerî derman e. Wê helwestê jî hîşt ku hemî tundrew û têrorên cîhanê li serê me kom bibin, têror û tirsa wan tev yên rijîmê bibin, û hemî dewletên cîran û dûr jî destê xwe dirêje nava Sûryê bikin. Ango şerê ``hurçan liu nav garisê Sûriyê tê kirin``.

Li rexê din, rikberî jî dev ji mercên xwe yên pêşinde bernade. Loma jî, gelê Sûriyê ketiye nav sê agiran; yek serhişkiya rijîmê ye, didu devbernedana rikberiyê ji mercên pêşinde ye, sisê, têrora Dai`şê û yên mîna wê ye.

Pirs ew e, di pirojeyê de ne hatiye diyarkirin ku mercên pêşinde çi ne. Hemî pêrew û şopînerên rêzanî tev dizanin, ku merca sereke ew e, ku serokê Sûriyê Beşar El Esed dev ji destlatê berde. Ev dirûşma xwepêşandanan a yekê bû. Mirov li vir dîsa dipirse, eger rûxandina rijîmê bi hemî bingehên wê ve ne armanc be, ma çima şoreş rabû? ………..❸

---

**ENKSê … Dûmahîk**

Di navbera 43 mihan de ji temenê ENKSê, pir av herikî, bi sed hezaran mirov li Sûryê hatin kuştin, birîndarkirin û winda jî bûn. Bi hezaran sivîl, xort û keçên Kurd ên şoreşvan pakrewanî bûn. Bi milyonan xelkê sûrî û bi sed hezaran kurd jî warên bav û kalên xwe berdan, mişext û penaber bûn. Wêrankirina şêngeh û civaka sûrî û kurdî jî ji encamên wê bobelata giran in.

Roja îro mirovê Kurd dipirse: Di nava van xişm û bêtarên mezin de, ENKSa me çi kir, bi çi karî rabû û di navbera 43 mehan de bi çi mijûl dibû?

ENKSê di nava dora sê salan de civînên xwe bi tevahiya endamên xwe li dar nexist. Du herêmên kurdî(Kobanê û Efrîn) ji civîn û standina biryaran bêpar man. Nêzîkî sê salan derbas bûn û kongirên wê yên salane li dar ne ketin. Destê hinek serkirde û partiyên wê di perçekirina çend partiyên ku endamên wê ne aşkere hebûn. Heft partî ji nav xwe derxistin û ``kûpîne lîstok``ji partîne nû danîne şûna wan. Ji qelsî û liva xwe ya giran xelas nebûye. Ji destpêkê de û hîn jî wilo ye, partiyeke tenê dixwaze bibe rêber, xudî biryar û ENKSê ji xwe re bike sîper û berjewendiyên partîtiya xwe pê pêk bîne. Herdem bi nakokiyên navxwe mijûl e û ji xebat û pirsên giring re ne vala ye. Bêhna gendeliya diravî û îdarî ji nav hildikele. Bi dehan endamên wê yên serbixwe dev jê berdane. Nikare li biryarên xwe xudî derkeve û bi tu Karên berçav ranebûye. Partiya ``sereke`` hewil dide daxwazên xwe bibe serî, û nêrînên bilî xwe qebûl nake. Ji bilî van xalan hîn gelek pirs û pirsgirêkên giring hene, lê li vir nepêwîst e ku em hemiyan bijmêrin…

Roja îro, hemî xelkê me li ser van xalan daxive. Rastiya rewşa ENKSê ev e û derdên wê jî ew in. Ango em van tiştan ji ba xwe dernaxin û zêde nakin.*

**Pirojeya … Dûmahîk**

**B- Asoyên çareseriyê:**

Divê doza guftûgoyê li hemî pêkhateyên rikbera Sûrî (partî, bizav, komele..) were kirin, ne bes di riya ragihandinê re, lê bi riya hevdîtinan bêne kirin. Gava ew hevdîtin û guftûgo werin kirin, wê gavê li hevkirinên bi ber çêbibin, û doza hevbeş ji pirojeya çareseriya aştiyane ji qeyrana Sûryê di riya guftûgoyê re tê vekirin. Ji hêzên rikber re jî netê gotin, ku va ye win di têkoşîna leşkerî de bi ser ne ketin û gerek e win şerê xwe rawestînin. Ji ber ku ev gotina çend pirsan tîne holê:

Gava ji hêzên leşkerî were xwastin, ku gerek ewin şer bê merc û ji alîkî de rawstînin, ji ber ku win bi ser ne ketin; ewê tavilê bêjin, em ne şikîne! Û helwesta rijîmê jî wê ji wê rawestandinê çi be? Bi nêrîna me, ev daxwaza ciyê xwe nagire, ji ber ku roja îro, pir bêlûk tev hev dibin û hêzine mezin, hikardar çêdibin û nexşeya leşkerî li ser zemînê diguhêrin. Nimûne; Li Idlibê, Helebê, Der`a û hîn jî ew yekbûn berdewam in.

Rêxistina Da`şê û Eniya El Nusra ji hêzên leşkerî yên rikberê derxînin, ên din bi pirogramên xwe Sûrî ne. tevî ku em hinekî bi daxwaz û armancên wan re têvel in, lê bi nêrîn, kes û pirojeyên xwe sûrî dimînin.

Roja îro tu kes nikane wan hêzên sûrî ji çareseriya qeyrana Sûryê bide alêkî û dûrxîne. Erê tevî ku ew leşker in jî, lê tiştên siyasî yên hevbeş di navbera me de hene. Nakokî jî wê bi guftûgo, danûstandinê û bi demê re ko bibin û werin çareserkirin.

Giring e xala lihevkirina rikberê li destpêkê were kirin. Ango piştî pêwendî di navbera hêzên rikberê de bi ser kevin doza kongireyeke niştimanî ji hemî aliyên rikberê re were kirin. Ew kongir wê biryarê bide, ku şerê çekdarî bi ser neket û gerek e were rawestandin, dest bi çareseriya aştiyane di riya guftûgoyê re bikin û bi rijîmê re bajon serî.

Ji wê kongirê lêvegereke siyasî derkeve.

Ew kongiir doza hêzeke leşkerî, niştimanî û yekgirtî bike, hêzên leşkerî yên rikberê ciyê xwe di nava rêzên ew leşkera niştimanî ya siberojê de bigirin. Yên razî nebin di bin sîwana ew hêza niştimanî kevin jî, destên hêzên siyasî yên rikberê wê ji paş wan were kişandin.

Ew kongir wê biryarê bide, ku hemî şervanên biyanî ji sûriyê werin derkirin.

Ew kongir wê doza têkliyên terezû û hevbeş bi hemî dewletên cîran re bi şêweyên berjewndane werin kirin.

**C- Di rewşa kurdî de:**

Ji pirojeyê tê têgihîştin, ku divê Tevgera Kurdî li Sûriyê xwe bide hev û çerçewên ku hene careke din kar û xebata xwe gur bikin. Ji ber ku, ji bilî riya yekgirtinê serkftin tuneye. Ev yeka ji hêla dost û dijminên kurdan de nas û zelal e. Li roja îro, lêvegera rêzanî çarçoveya herî baş e û li gorî demê ye. Ger xalên Hilkeftina Duhokê werin cîbicîkirin, emê vê qonaqê bi encam û aştiyane derbas bikin.

**D- Di warên têkliyên kurdistanî de:**

Berî her tiştî, divê têkliyên kurdistanî li ser bingeh û hîmê rêzdariya hevbeş werin hûnandin. Em Kurd yek netew in, lê rastiya ku heye, ew e ku perçebûna me di navbera çar dewletan de ye, her dewletek jî bi sînor, al û di Yekîtiya Netewan de xudî mikur û kursî ye. Ew rastî jî di riya zagona navdewletî re tê parastin.

Li vir, di roja îro de, bila tu kes, partî û hêz dirûşûmên vebrûstî ên berjewendiyên taybet nefroşin gelê xwe. Li dema îro rewş û nîrên kurdistanî, herêmî û cîhanî hene, pêwîst e li gorî wan karê hevbeş were ristin û kirin. Lê giring e, ku em kurdên Sûriyê baş bizanibin ku di warê niştimanî de, gerek e serok û serkirdeyên me ji me bin. Pêwîst e em serkirdeyên doza xwe û kargêrên tevgera xwe bin. Gava ku hin partî xwe wek şaxekê yan beşekî ji hin partiyên kurdistanî re dibînin, ew kêmaniyê bi mafê xwe dikin. Li rexê din, gava ku ew partiyên kurdisatnî dixwazin hin şaxan di nava Kurdistana Rojava de çêkin, careke din ew xwe şaş dikin û rêzdariya taybetiya doza me û biryara me ya serbixwe nagirin.

Li dawiyê em dimînin kurdên sûrî, û çareseriya doza me li Şamê dibe, bi pêkhateyên sûriyê re ye. Ne Kurdên beşên din şûna me digirin, ne jî em şûna wan digirin. Divê em hemî baskên biratî û hevbeş ji hev re vegirin û ji hev re bibin alîkar.

Li dawiyê spasiya PYDKS dikim, ku ev piroje pêşkêş kiriye û hêvîdar im ku nemîne tenê mijarek ji ragihandinê re……

### Sûryê … Dûmahîk

Hêzên rikber destên xwe danîn ser çend baregehên (leşgerî) leşkerî yên dewletê jî. Li Rojhilata Sûryê jî, Rêxistina Dewleta Îslamî karîbû bajarê Tedmurê yê navdar dagîr bike û hêzên sazûmanê jê derîne. Yanê bi tevahî, tenê dora %35 ji xaka Sûryê di bin destê sazûmanê de maye.

Ev guhertinên mezin li ser zemînê diyar dikin, ku çiqasî hêzên leşkerî yên sazûmanê lawaz bûne û westiyan e. Lê, tiştê balkêştir ew e, ku di gel hemî nakokiyên navxweyî yên hêzên rikberê, ew di vê demê de, nemaze jî li Bakur û Başûrê Sûryê, wekî ku nişka ve, bi hêzbûn û xwe kirin yek.

**Rola Tirkiyê, Si`ûdiyê û Qeterê**

Li gora gelek çavdêr ku rewşa Sûryê dişopînin û raporên rojnamegerî, wek rojnama N.Time ya Emerîkî û bilî wê jî, ew yekbûn û bihêzbûna ku li ba rikbera çekdar çêbûne, di siha lihevkirina dewletên Tirkiyê, Si`ûdiyê, Qeterê de pêk hatine. Ew yek jî ji bingeha xwe de li hember destêwerdana Êranê û ji qereza wê re bûne. Nemaze jî piştî ku Komara Îslamî ya Êranê destê xwe dirêjî nava Yemenê jî kir, û gelek rayedarên wê aşkere jî gotin, ku ew niha li çar paytextên Erebî (Şam, Bexdad, Bêrût û Sen`a) destlatdar in. Wê hîngê, û wek bergirî li pilanên Îranê, dewletên Kendavê ku berê dijberên wê ne, li gel Tirkiyê, rûpelên dîroka Impretoriya Farisî vekirin, û li ser du eniyên sereke li dijî pirojeyên wê xebitîn, yekem: Li Yemen, didu jî: Li Sûryê.

Ji bo şikandina ``pirojeya Farisî-Şî`î`` li Yemenê, û bi xweşdîtin û belkî bi erêkirina piraniya Dewletên Erebî, Ewrupî û Emerîk jî, Erebiya Si`şdî û alîgirên wê di (Dewletên Hevpayman), de bareya[ĥemle] ((Bahoza Ĥezim)) bi ser Yemenê de rakirin û derbas nava qeyrana Yemenê bûn.

Bi taybetî Sûryê jî, wan her sê dewletên navborî, eniya şer li Sûryê jî geş kirin; li Başûr di riya Urdunê re, û li Bakur jî di riya Tirkiyê re. Her du dewletan, Si`ûdiyê û Qeterê pere û çekên nûjen şandin, û di bin zexta wan û Tirkiyê de, rêxistinên çekdar ên îslamî ên çalak mîna C.El Nusra, Ensar El Şam û bilî wan jî, ji hev re bûne alîkar û hêzine hevbeş li Bakur û li Başûr jî bi navê (Artêşa Fetih) ava kirin, û herwiha bi destêwerdana wan dewletan ew serkeftinên berçav bi dest xistin.

Pirsek derdikeve meydanê; ma ew rêxistinên Îslamewî yên çekdar wê karibin hîn pêşde herin, û ta kîjan bergehê wê rêk ji wan re vekirî be?

Jêderên siyasî dibêjin, ku ev lihevkirina sêqolî ya Tirkiyê, Si`ûdiyê, û Qeterê ne bi temamî li gora helwest û nêrîna rêvebiriya Emerîkana ye. Ji ber ku ew naxwaze Eniya El Nusra, wekî ku şaxeke Rêxistina Qa`îdê ye, weke hêzek rikbera Sûrî were pejirandin û serqoriya xwe jî li deverên ku ji bin destê sazûmanê derdikevin bike. Belkî rêvebirya Emerîka wê yekê wek zexteke demkî li ser sazûmana Sûryê qebûl bike, lê kok napejrîne ku ew tevdîr feretir û kûrtir bibe, û C.El Nusra bibe hêza çekdar û destlatdar a yekem, û hîn dakeve nava navçeyên Elwiyan û Filehan li navîn û Rojavaya Sûryê jî!. Loma jî, baweriya mezin ew e, ku Artêşa El Fetih ku C. El nusra tê de ya mezintir e, wê navçeyên parêzgeha Idlibê derbas neke, tewir hindik di van çend mehan de.

**Sebareta bajarê Helebê**

Bi taybetî rewşa bajarê Helebê jî, çavdêr û rikbera çekdar jî dibêjin, ku tiştê rewş li ser sînorên şer di nava bajêr de rawestandiye, tirsa ji koçberkirina bi sed hezaran mirov e ji bajarê Helebê. Lê eger sazûman bombekirina bajêr berdewam bike, û bereyên şer jî germtir bike, gengazî heye ku ew jî mîna Idlibê ji destê wê derkeve, û bi wê yekê sazûman wê tevahiya Bakurê Sûryê ji dest bide, û bi wê yekê rewşine, serbazî, destlatdarî û siyasî yen nû wê çêbibin.

Wê gavê Sûryê ji hêla Serbazî, û destlatê û hêzên serdar ve wê bibe çar beş: Hevbenda rikberên Îslamî li gel C.El Nusra li Başûr û Bakur Rojava Sûryê; Rêxistina Dewleta Îslamî ((Da`iş)) li Bakur û Rojhilatê; Kurd li navçeyên xwe, û sazûman jî li navîna Sûryê û perava Derya Sipî.

Bawerî ew e, ku li wê demê qeyrana Sûryê wê bigihê ....... 11

# Li Ser riyan... Rêwiyên Me!

*H*er demekê, rêwiyên Kurd yên ku ji herêma Efrînê diçin Heleb û Şamê, ji hêla hinek çekdarên rikberê ve tên astengkirin û binçavkirin jî. Bihane jî herdem yek e, ew jî nakokiyên di navbera wan û hêzên kurdî de ne li herêma Efrînê. Dema ku ew nakokî yan pirsgirêk derdikevin holê û çareser nabin, çekdarên rikberê, sivîlên Kurd li ser rêkê digirin û wek berdêl ji bo bicihanîna daxwazên xwe re bikar tînin.

Li hember wê, bi hezaran penaberên Ereb ji hemî deverên parêzgehên Bakurê Sûryê, belkî ew ji alîgirên hemî layanên rikberê bin jî, li navça Efrînê dijîn û tu kes nêzîk wan nabe, na belê, ew mîna welatiyên Kurd dijîn û belkî ji wan bi qîmetir bin jî.

Tu zagonên bajarvanî, peymanên navdewletî û hemî ol, li serê wan jî ola Îslamê ya pîroz, qebûl nakin û rewa nabînin ku kesên sivîl û bê guneh, ji ber çi tiştî û bihaneyê be, wekî berdêl werin girtin û bikaranîn. Mafên hemî sivîlan li gora hemî zagon û şerî`etan û li her derekê parastiye; çi di demên aştiyê û çi jî di nava rewşên şer û pevçûnên çekdar de. Eger ew aliyên rikberê yên çekdar tenê li baweriyên xwe yên olî vegerin, ewê rêkê li kesên sivîl nebirin û wan weke berdêl negirin.

Bi taybetî jî, gava em zani bin, ku ew kesên di van rewşên

Riya Efrîn û Helebê ya normal




dijwar de, dilê xwe dixin destên xwe û li ser rêkan, di navçeyên şer û pevçûnan re derbas dibin, ew pir neçar in ku xwe têxin nava metirsyan, di nav wan de jin, zarok, pîremirov û gelek nexweş jî hene, hemî jî neçar in ku herin karên xwe biqedînin.

Eger tiştekî rikber û bitaybetî jî ya C. El Nusra bi hêzên çekdar ên kurdî re hene, bila yekser û bi guftûgoyê bi wan re çareser bikin. Eger ew rast ji ber azadî û rûmeta gelê Sûrî de şer û cîhadê dikin, gerek e, di serî de, rêz û rûmeta her mirovekî Sûrî were parastin, û pirsên mîna nijad, ol û binola nebin bihaneya helwestên şaş. Bi karên wiha, mirovên Sûrî ji hêzên rikberê nefret dibin û dûr dikevin.

Roja îro Efrîn bûye giraveke biçûk di nava deryake pêldar de, ji du aliyan de têl û bombeyên sînorê Tirkiyê wê dipêçin, ji du aliyên din de jî komên çekdar ên têvel hene. Di vê rewşa teng û

Riya Efrîn û Helebê ya nuha



dijwar de, hişmendî û sebreke pir fere gerek in. Gerek e silametiya mirovê me xema me ya yekê be. Çinkî, li dawiya dawîn, ``Welat mirov e û mirov jî welat e``. Welatê bê mirov xakeke ker û lal, mirovê bê welat jî jîndarekî aware ye, ha li ber vî dîwarî û ha li ber wî dîwarî dimîne.

Zor pêwîst e ku hemî aliyên rikberê rêza welatiyan bigirin, jiyana wan hêsan bikin..

Mirov ji çi netewê û ji çi olê dibe bila bibe, ew afrandeyê Xweda ye, û gerek e jiyan, rûmet û arzûyên wî cihê rêzê bin û werin parastin.*

## Konfiranseke … Dûmahîk

Li destpêka konfiransê, deqa pirojeyê hate xwendin. Deq ji van beşan pêk dihat:

Pêşgotin. Li ser pêwîstiya hebûna projeyên çareseriyê û pêwîstiya lihevkirinê di rewşa Sûrî bi tevahî û Kurdî bi taybetî bû.

Di rewşa Sûrî ya tevahî de. Li derbarê serhişkiya sazûmanê, û tunebûna rêberiyeke siyasî ye tevahî jidestpêka tevgerana gelê Sûrî de, wan her du kirdeyan kir ku berê wê bi aliyê çekdarî de here, bibe şerekî nevxweyî û wêrankirinên mezin û fere bi xwe re wîne.

Asoyên çareseriyê. Ji şoreşeke wiha hêvî nabe ku armancên xwe di guhertina tevahî de pêk wîne. Roja îro hêzên tundrew destê xwe danîne ser bêtirî nîvê rûbera Sûryê. Hêzên çekdar rêza pêşîn standine û hêz û partiyên siyasî jî vegerîne rêzên paşîn û bêçare bûne. Piroje riya çareseriyê di hevpeyvînên di navbera hêzên niştimanî yên Sûrî de dibîne. Proje pêwîst dibîne ku gerek e hemî hêz bibînin ku çareseriya leşgerî têkçûye, gerek e wê rastiyê bipejrînin, dest bi guftûgoyên siyasî û aştiyane bikin, şer rawestînin û tiştê ku ji welêt maye biparêzin. Ev yeka jî bi riya lidarxistina kongireke niştimanî ye tevahî çêbibe. Pişt re, nûnerên wê kongirê bi alkariya Yekîtiya Netewan bi




sazûmanê re têkevin goftûgoyan. Lê li destpêkê weke pakniyazaî, divê hemî girtiyên siyasî li ba hemî aliyan werin serbestberdan, ragihandin û gurkirina şer rawestin, piştgiriya siyasî ji hêzên çekdar were birîn û hemî şervanên biyanî ji Sûryê derkevin.

Di rewşa kurdî de. Pêşgotina tevahî li ser rewşa kurdî û tevgera siyasî ku navnîşana wê perçebûne hat xwendin. Lê digel wê perçebûnê, hêzên kurdî yên siyasî kanîn xwe ragirtina û neşimitîna nava şiwîteya şerê Sûryê. Wê helwestê daxwaza sazûmanê û hinek aliyên rikberê jî têkbir û gelê Kurd ji metirsiya mezin parast.

Ji bo rewşa Kurdî Sûrî jî, proje van xalên sereke rast dibîne û pêşniyar dike:

Pêwîst e ku hemî hêzên siyasî kurdî li hev bikin, û Lêvegera Kurdî vejînin. Di vî warî de nermkirina helwestan ji aliyê ENKS û TEV-DEM de gerek e. Pêwîst e ku YPJ, YPG, asayîş û Rêbertiya Xweser ji hêla hemî aliyan de werin pejrandin û hemî bi hev re lê bibin xudî û pêşde bibin. Pêwîst e hêzên kurdî bi nêrîneke siyasî û helwesteke hevbeş dakevin pêşberî hêz û gelê Sûriyê.

Piştre, rê ji pirsan re hate vekirin. Piraniya nûner û peyamnêran pirsên xwe kirin. Pirs bi tevahî li ser naveroka projeyê bûn. Çend pirs li ser helwesta Partiya Yekîtî-Elwehdê ji ``zagona berevaniya xweser`` û li ser derbasbûna partiyê li nava Rêberiya Xweser jî hatin kirtin.

Bi tevahî proje wek deq û nêrîn baş hat nirxwandin. Lê hinekan jî gotin ku proje ne li gor dem û rewşê ye, dem di ser pirojeyeke wiha re derbas bûye. Loma jî guman dikirin, ku egerên têkçûna wê, dê ji yên serkeftinê bêtir in?!*

**AHENGÊN 15ê... Dûmahîk**

û hezkiriyên zimên li mala Celadet Bedirxan a Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li bajarê Efrîn kom bûn û cejn li hev pîroz kirin. Piştî ku bixêrhaina beşdaran hate kirin, daxuyana ku ji hêla Saziyê de ji bo boneyê derketi bû hate xwendin. Piştre çend mamostan gotinên kurt kirin, tê de giringiya boneyê xuya kirin û reseniya zimanê kurdî diyar kirin, ew zimanê ku li gel hemî asteng û rewşên dijwar, karîbû xwe li dirêjiya hezar salan xwe biparêze û di nava zimanên Rojhilata Navîn de cihekî bilind bistîne. Li jêr çend bend ji daxuyana SFPZKê.

*((Li Rojhilata Navîn zimanê kurdî ji zimanên kevnar e, ew ji şaxa asyayî ya zimanê Hindo-Ewropî ye.*

*Zimanê kurdî di pêvejoya xwe ya dîrokî de toşî pir zor û qedexekirinê bûye, lê di gel wê jî dîsa kanî xwe biparasta.*

*Di roja 15ê Gulana sala 1932an de, Mîr Celadet Bedirxanê kovara Hawarê bi zimanê kurdî û bi tîpên latînî derxist û herwiha dest bi pêvajoyeke nû ji pêşdebirina zimanê kurdî bû.*

*Li sala 2006an, hinek saziyên zimên li Bakurê Kurdistanê ew roj wek ``Cejna Zimanê Kurdî`` binavkirin û hersal ji hêla sazî, hezkir û rewşenbîrên kurd ve tê bibîranîn û lidarxistin.*

*Em jî wek Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Sûriyê, vê cejnê li xwe û li netewa kurd pîroz dikin, û soz didin bi qaserî ku em pêkanin emê ji ber zimanê xwe ve bixebitin.*

.....

*SFPZK di pêvajoya hînkirinê de nêzîkî deh hezar şagirt bi sê astan li seranserê herêmên kurdî fêr kirine. Îro jî, em pir şan e ku zimanê kurdî ketiye dibistanan û bi şêwek fere tê hîn kirin, ew daxwaza me ya sereke bû û pêk jî hat....*

*Em wek Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî bi hêvîn e û doz dikin, ku hemî sazî û rêxistinên hînkirina zimên li Rojavaya Kurdistanê li rex hev kar bikin, bi şêwekî hevbeş rêbazên hînkirinê dînin û di dibistanan de bi erka perwerdekirinê rabin)).*

***-Bila Cejna Zimanê Kurdî bibe gavek ji siberojê re.***

***-Spas ji hemî mamoste û kesên ku di ber ``zimanê dê`` de xebitîne û dixebitin.***

***-Cejna Zimanê Kurdî li gelê me pîroz be.***

*15.5.2015Z–2627K.. S.F.P.Z.K*

**Ahenga Cejna Zimên Li Bajarê Qamişlo:**

Roja 15ê Gulanê sala 1932an, yekemîn car kovareke Kurdî bi tîpên Latînî bi navê Hawar ji bal zimanzan û têkoşerê Kurd ê navdar Mîr Celadet Bedirxan ve li Şamê hatiye çapkirin û weşandin, û ji bal Kongira Netewî ya Kurdistanê ve, ev roj mîna Roja Zimanê Kurdî hatiye bi navkirin.

Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî Li Sûriyê, li bajarê Qamişlo ev bîranîna pîroz bi ahengekê bibîr anî. Birek rewşenbîr, zimanhez û welatparêzên Kurd lê beşdar bûn. Çend gotin û hin helbest ji



beşdaran re hatin pêşkêşkirin, ji wan:

Gotina mamosteyên Saziyê ji bal mamoste Canda Erefat ve hate xwendin, û

gotina Saziyê, ji bal rêzdar Gurgîn Îsa ve hate pêşkêşkirin, eve çend movik ji wê gotarê ne:

***".. Mamosteyên hêja,***

***Mêhvanên berêz,***

***Beşdarên bi rûmet,***

*Zimanzan û civaknasan ziman dane nasîn weke alava danûstandin û têkildariyê di jiyanê de. Li gorî vê pênaseyê, merov ziman bikar tînê ji bo hest û ramanên xwe bênê ziman, û têkiliyên rewa bi derdora xwe re ava bike. Belê, ev delameta zimên di navbera kesan de ye, lê ew di jiyana miletan de ji vê girîngtir e. Serpêhatiyên gelan, şûnmayên netewan û ezmûnên ku seranserî qonaxên jiyana merovahiyê cih girtine, bi riya zimên ji nifşekî bo nifşekî din têne veguhestin. Bi vî awayî, ziman dîroka netewan diparêzê. Ji aliyekî din ve, çand û wêje jî bi hebûna zimên têne parastin. Bêguman, zimanekî xurt û bi rêkûpêk çandeke xurt û dewlemend ava dike; û wêjeya bi zimanekî wisa bête nivîsîn jî wê têr û zengîn be. Nexwe, zimanê her netewekî alava herî girîng e, ne tenê ji bo ........*

8

**AHENGÊN 15ê… Dûmahîk**

*parastina dîroka wî bi şêweyekî rast û durist, lê belê ew bingeha avakirina çandeke xurt û zengîn e jî. Lê, li hember vê jî, tunebûna zimên talankirin û windabûna netewê bi xwe ye. Ji ber vê girîngiya zimanan di jiyana miletan de, UNESCO li ser pêwîstiya zimanên zikmakî rawesta. Wê bal kişande ber bi rêzgirtina zimanên netewî, û bandora pirzimanîyê li pêşxistin û dewlemendiya çandê seranserî cîhanê. Wê di 17.11.1999ê de biryareke pir pêwîst, weke zengilekî hişyarkirinê de, û roja 21ê Sibatê weke Roja Navnetewî ya Zimanê Dayîkê bi nav kir…. Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Sûriyê ji Nîsana sala 2006ê ve, bi karê fêrkirin û parastina zimên radibê, û ta îro jî ev xebata me berdewam e. Em hêvîdar in ku hemû beşên civaka Kurdî, her beşek li gorî derfet û karîbûna xwe, xwedî li zimanê xwe yê şêrîn derkevin da ku em wî ji windabûnê biparêzin, û xwe jî bi wî biparêzin.*

*Ziman nasnameya me ya netewî ye. Ew hebûn û mayîna me ye. Roja Zimanê Kurdî li me, li we û li hemû miletê kurd pîroz be…."*

Herweha, mamosteyê zimanê Kurdî rêzdar Derwêşê Derwêş gotineke nivîskî pêşkêş kir, tê de li ser rewşa zimên û toreya Kurdî axivî, kêmasiyên tevgera Kurdî li Sûriyê derbarê kêmguhdana zimanê dayikê diyar kir, lê ew geşbîn bû ku rojên li pêş, rojên zimanê Kurdî ne.

Gotineke devokî ji bal rêzdar Dilawerê Zengî ve hate pêşkêş kirin. Bi firehî ew li ser rewşa zimanê Kurdî peyivî. Her weha, wî hin gotin û nerînên civaknasê Tirk ê navdar Ismaîl Pêşekçî ku dema xelata Osman Sebrî radestî wî kiribû ji beşdaran re aşkere kirin.

Herweha mamoste Konê Reş gotineke nivîskî ji beşdaran re pêkêş kir, eve çend movikên bijarte ji deqa gotina wî ye:

*…"UNESCO di roja di 17.11.1999 de, 21ê sibatê bi navê “Roja navnetewî ya Zimanê Dayikê” bijartibe û bi nav kiribe, ya me Kurdan, wek ku ji berî çend salan ve belav bûye roja 15 gulanê ye, û ev roj ji sala 2006an vir ve tê pîrozkirin. 15 gulanê, ev roja ku yekemîn car kovara HAWARê li Şamê hatiye weşandin û di nav Kurdan de hatiye belavkirin. Wek ku diyar e, ji berî 83 Salan ve; di roja 15ê Gulana 1932an de yekemîn car di dîroka Kurdan de ku zimanê Kurdî (Kurmancî û Soranî), bi alfabeya Latînî hatiye nivîsandin û ji wê hingê ve rewşenbîrên Kurd his û hestên xwe bi zimanê dayika xwe anîne û tînin ziman.. Bi saya wê rojê û bi saya xwediyê HAWARê mîr Celadet Bedirxan, roja îro em xwedî alfabeyeke xweser in û roja îro bi sedan, bi hezaran ji rewşenbîrên ku bi zimanê Kurdî dinivîsînin hene û bi dehan navend, enstîtu û komeleyên Kurdî hatine damezirandin û di xebatê de ne.. Her wiha bi sedan kovar, rojname û malperên internetê bi zimanê Kurdî, alfabeya latînî li seranserî dinyayê çêbûne.. Werin em bi geşbînî vê rojê (15ê Gulenê), wek roja zimanê Kurdî pîroz bikin.. Wek ku çawa 22ê Nîsanê bi navê roja rojnamegeriya Kurdî hatiye binavkirin, bi me xweş e roja 15ê Gulenê jî li seranserî Kurdistanê, bi navê roja zimanê Kurdî bê bi nav kirin. Zimanê me, ne kêmî zimanê xelkên derdora me ye, kok û rehên zimanê me li hezarê salan vedigere, rewaya xwe ji ava çemê Dicle û Ferat distîne, bi çiyayê Cûdî, Barzan, Zagros, Toros û Agirî re mezin bûye.. Bi keleka Nûh pêxember re geryaye û dawî ji Cizîra mîr Şeref di dinayê de belav bûye.."*

Li ser navê Kovara Pirs û Weşana Newroz jî rêzdar Newafê Bişar gotineke nivîskî di vê bûneyê de bi beşdaran re parve kir, ev hin ji xalên wê ne:

…"Di vî warî de, civaknas û xebatkarê Tirk ê navdar, profesor **Ismaîl pîşekçî** nimûneyeke balkêş û watedar di pirtûka xwe ya bi sernava "Ziman-Nasnanme - Netewe û Neteweperwerî" de pêşkêş dike, çawa ku mamosteyekî Tirk î nûhatî diçe herêma Kurdistanê mamostetiyê dike. Mamostey tirk nijad, kêmasî û pêdiviyên dibistana gund di lîsteyekê de dinivîse, bi gerînendeyê(mudîrê) perwerdeya netewî re dicive, wî bi rewşa kambax a dibistanê serwext dike, û wan xwestek û pêdiviyan jê re dixwîne. Lê, mamoste, ji helwesta gerînende matmayî dimîne dema ku lê vedigerîne, dibêje:

*……" Xoce!, daxwazên me ji te wekî desdarek, gelek sivik in. Em du tiştan ji te dixwazin. Em dixwazin tu van du tiştan fêr bikî. Ya pêşî ev e ku, tu her fêrî wan bikî ku ew tirk in, ew ji Asya Navîn hatine, ligel vîya jî, wan fêrî zimanê tirkî bike. Pêşî bigre ku ew bi wî zimanê xwe yê primitiv(bîdayî) biaxivin, wisa bike ku bila ew wî zimanê xwe yê kovî(wehşî) ji bîr bikin. Bona vê yekê çi ji destê te hat, qet texsîr meke!...Ya duduyan jî, bîne bîra wan ku, em misilman in, em birayê hev ên dînî ne. Tu vana fêrî wan bike bes e, wekî din, qal û qîl in, qet ne giring in…"***(1).**

Li sala 1927an, komela ….. ⓫

# Çima Bi Kurdî? !!

Vejîna Kurd

Li sibeheke têrhêvî, berbangê ne ji zû de xatir xwestibû, û rojê bijangên xwe yên têrevîn di govdeya asîmên de serbest berdabûn. Bakî hênik li rodanka dilê min xist, û bi bêhna qehwê ya ku ji fîncana min difûrî, û bi awazên tembûra Mihemed Şêxo re, rewanê min sermest dibû.

Kêlîk bi kêlîk.. ez di buhişta vê heyamê de noq dibûm, û weke her car, min dest avêt newqa pênûsê û min xwest ez hinekî ji kela dilê xwe birjînim ser rûpela keçîn.

Çirûska ramanan perda demê dibirî, û li ser spehiya rûpelê tîpên kurdî dikeniyan, û rengereng gol vedidan. Di mejiyê min de, pirsa ( Çima bi kurdî dinivisînim?!!) jenî û bersiv hêvî kir.

Ez li berhema ku bi hestên zelal û hêsayî ji pênûsa min herikî bûn vegeriyam, min his kir, ku ev ziman wek pêlên hênkahiyê xwe berdide nava hinavên min, û ew tîpên latînî dikarin deşt û çiyayên hêviyên min bi ber bikin.

Li vî welatî; her tiştek bi kurdî reng dide… Solîn bi kurdî dibişkuvin, mêrg û çîmen bi kurdî şîn dibin, Buhar bi kurdî geş dibe û Payîz bi kurdî serê xwe dişo. Li ber dergûşan.. dayîk bi kurdî dilorînin û zarok bi kurdî dikenin û digrîn.

Ji bilî zimanê kurdî, tu ziman nikare tabloyên me bi rengên xweşik wêne bike, germahiya hestên herikî binoşe û wergerîne nivîsandinê.

Belê.. Tenê mirovên ku ji ava kaniya zimanê Kurdî vexwerine û pê sermest dibin dikarin têbighên û binirxînin. Lê hîn bersiv bi dawî ne bûye.

Kurdî.. deryayeke kûr, fireh û bê dawî ye. belkî niha melevanên wê kêm bin, lê ez bi bawer im, di paşerojê de, ew dê pir û pir bibin.

Nivîsandina bi Kurdî şanazî û serbilindî ye. Ew pirsa sar a di kêlîkekê de, ku di mejiyê min de hatiye meyandin, dê tucarî min nequfilîne, pênûsa min sar neke û heya ez hebim ezê xama wê ji av û heyama Kurdistanê bistînim û lênûsa xwe bi wan tîpên zêrîn germ bikim.

# Komara Xeloyê Me!

Xelo di nav asoya ramanan de melevaniyê dike û tengijî ye… Diponije..peyalên meyê ji wî têr bûne, kolanên pêjnên wî ji sîng û qîtan hêgin bûne, berîka wî dest bi nalînê dike, ji nişka ve birayê wî Misto hate bîra wî, û şîrav ji têlefonê barî …Alooooo keko tu baş î? Tu li kû de rê yî? Misto: Ez rind im li orta gund im.

Xelo: Baş e, baş e keko, te zêtûnên min ajotin? Misto: Xelo! Tu yî ? Belê min ajotin û çinîn û firotin, û ezê tev bazirganekî ji te re bişînim.

Bêhna Xelo fereh dibe û zimanê wî dilovaniyê li xwe dipêçe û dibêje: Pere ne di bîra min de ne birayê delal, tê di zûtirîn dem de peran bişînî? Xelo di nav peyvan re cirîtê dike, gilêza peran bi devê wî dikeve û axaftina xwe berdewam dike: Baş e dayika me û bavê me û milkê min hemî baş in? Misto: Em tev baş in. Tu çawa yî? Xelo: Ez gelek westiya me û bi şev û roj ji bo doza gelê xwe xebatê dikim.

Zengilê derî lê dikeve, Xelo derî vedike, keçikeke nîvtazî dikeve hundir.. peyalek mey ji Xelo re dadigre û di hembêza Xelo de rudine. Xelo peyalê bi ser lêvên xwe de dike û dibêje: (Jiyan yan hane be yan tunebe); Misto: Tu çi di bêjî keko? Xelo li xwe hay dibe û dibêje: Keko siyasetmedarekî Almanî hate ba min û ez bi wî re li ser xebatê daxivim. Belê keko pêwendiyên gelan hişê min birine, û gelek ramanên pêşketî têne bala min, wek nimûne: Ez di kolan û bajarên Almaniya re dimeşim, mêze dikim hemî bûne Kurd û ji çar perçên Kurdistanê li vir bûne koçber. ...............

10

Tendurstî

# Zerik (Kulbûna Kezeba Reş Bi Vêrûsa(A))

♦ **Bijîşkê Newrozê**

**B**i kurdî jê re ``Nexwaşiya Zerikê`` tê gotin. Ji ber ku, dema mirov bi vê nexwaşiyê dikeve, sipîkiya çavan, govde û mîza wî jî zer dibe. Ew bi piranî li ba zarokan û di temenên biçûk de çêdibin.

**Sedem**: Vêrûsa kulbûna kezebê ji cureya (A) ye. Ew di pileya germê ya (85c$^o$) de û bi Kilorkirina ava vexwarinê dimire.

**Jêder û rêka vegirtina vêrûsê:**

**1-** Jêderên bingehîn ji vegirtinê re, ava ne pak û xwarina nekelandî ne, wek selete û keskahiyên ne pak ku nehati bine şuştin, yan jî bi ava gemarî hati bin şuştin.

**2-** Guhnedan bi pakbûna kesane, nemaze dema ku dayîk zarokên xwe pak dike û destên xwe naşo, çinkî riya (dev-pîsî) rêka bingehîn e ji vegirtina vê vêrûsê re, çi li malê û çi li xwaringehan.

**Berjeng û dîmenên vê nexwaşiyê çi ne:**

**1-** Zarokê nexwaş xwarinê kên dike, dil radibe, vedireşe, diweste, tayê digire, êşekên masûlkan, navçûn û zikêş jî çêdibin..

**2-** Zerbûna sipîkiya çavan, mîza zer a rengdagerî mîna çayê û pîsiya gewrik jî tê dîtin.

Dema ku yek ji van dîmenan li ba kesekî hat dîtin, nemaze li ba zarokan, pêwîst e ew seredana navendeke tendurustî yan bijîşk bike.

**Pêvajoya nexwaşiyê:** Berjengên nexwaşiyê derdora mehekê dimînin, nexwaş jî di şeş mehan de çêdibe û xwîna wî ji vêrûsê pak dibe. Hemî nexwaşên bi zerika vêrûsa (A) dikevin, rihet dibin û xwevegirtineke herdem werdigirin. Hilgirên vêrûsê jî tunene. Loma jî tenê hinek sebir û pêgirtina gotinên bijîşk bes dike, û kiryarên şaş jî mîna: Birîna guhan, xwînberdan û tiştên mîna wan ne tenê sûdê nakin, ew zirarê jî digihînin kesê nexwaş.

**Şîret, amoj û xwevegirtin:**

**1-** Guhdan bi pakbûna kesane hîmê bingehîn e, nemaze jî şuştina destan berî xwarinê û piştî derketina ji destavê, şuştina govde, birîna nênûkan û bilî wan jî.

**2-** Xwarin û vexwarina ku li kolanê tê firotan ew jî nexwaşiyê vedigirîne.

**3-** Gerek e xwarin pak be û were kelandin. Av jî pak, yan jî kelandî be, nemaze li demsalên Buhar û Payîzê, ew demên ku vêrûs tê de hêgin dibe.

**4-** Haya mirov ji nexwêş bi xwe hebe, wan maç nekin, amûrên wan ên ji bo xwarin û vexwarinê, pênûs û tiştên taybet jî bi kar neyînin. Destên xwe bi dev, poz û çavên xwe neke û xwarinê jî pê nexwe. Divê ev tişt ji roja ku nexwaşî hat naskirin de sê heftan werin kirin.

**5-** Vehes pêwîst e, ta berjengên nexwaşiyê winda dibin û rewşa nexwêş jî baş dibe.




## Komara … Dûmahîk

Pirojeyeke gelek girîng di serê min de digere, ew jî ev e:

Divê ez partiyekî ava bikim û serkirde, endamên navendî, berpirsyarên raghandinê û yên pêwendiyên hundir û derve bila ez bim, ji bo hevalên xwe di evê rewşa nazik û hestyar de ji lêdan û kuştinê biparêzim. Kek Misto di Welatê me de her tişt qedexe ye çand, huner, ziman, kultûra me, û her tişt buha ye ji bilî mirov û mirovatiyê, li vir azadî bi çiwalan heye û gelê me yê Kurd jî mezin e, ma ji bo çi ez bi navê xwe û partiya xwe ji hukûmeta Almaniya daxwaz nakim ko li vir ji me re welatekî bi navê " Kurdistana Almaniya" ava bike, û eger daxwaza min nepejrandin bila ( hukûmeteke fîdralî be), yan (Herêmeke navendî be ) yan (Herêmeke xweserî be) û eger ne bû, bila jineke Almanî be û ez ji vê armancê qet danakevim, ji ber ko di riya wê re gelek armancên istratîcîk wê pêk bên, keko li min bibore, mîvanê min rûniştiye û ez dixwazim tev wî ji bo gelê xwe di xebatê kevim. Silav li welêt bike. Baaay…!.

3 / 3 / 2015 - AFRÎN

## Hevpeyvîn … Dûmahîk

li gundê Miktelê ji dayîk bûme. Di sala 1974an de, ez bi Dr. Îlhamî re zewicî me. Dr. Îlahamî yek ji torînên Salihê Seyfî malmezinê hoza Dinan e. Ew ji bajarê Elîgorê ye.

**Pirs**: Ji bo beşekî ji penaberên Kobanê, te kedeke zor hêja kir, ma gelo te dixwest navekî ji xwe re çêkî, yan sedemine din hebûn?

**Bersiv**: Na.. Berê navê min Nehber e. Berê ez di herêma xwe de naskirî me. Dema ew bûyerên hovane ji aliyê çeteyên xwedênenas ve di ser xelkê me yê Kobanê de hatin, min dît pêwîstiyeke pîroz e, ku li gor kanîna xwe, ez bi erkên xwe yên mirovatî û kurdewarî rabim. Eger em li hev xwedî dernekevin, û bi êşên hev hestewar nebin, ma ji bo çi em mirov in?

**Pirs**: Ji bo alîkariya te ji penaberên Kobanê re, ji aliyê Dr. Îlhamî re nerazibûn hebû?

**Bersiv**: Na.. Dr. Îlhamî mirovperwer e. Min hêza xwe ji wî dibir. Ew pir û pir bi min re alîkar bû.

**Pirs**: Te tenê alîkariya mervên xwe dikir, an jî, ji her kesê ku hewcedarî alîkariyê bû.

**Bersiv:** Ma di rewşên wisa de, çêdibe ku mirov cudawaziyê têxe navbera xelkê xwe. Ez bi şêwakî gelemperî li ser penaberan digerîm, û tiştê ku ji destê min dihat, min dikir, û ta niha jî ez di vî karî de berdewam im.

**Pirs**: Nehber Xanim; li dawiya vê hevpeyvînê tu çi dibêjî?

**Bersiv**: Daxweza min ew e ku, hemû Kurd ji hev re hevkar bin, hevrêzî û yekîtiya xwe ava bikin, û çênabe em şerê hev bikin. Êdî bes e, bila zarokên me bê tirs razin û mezin bibin.

Zor sipas Xanima hêja, mirovperwer û xemxwara gelê xwe.

## Sûryê … Dûmahîk

lodika xwe ya herî bilind, û wê derî li pêş hemî gengazî û bûyerên nû vebin, wek: C.El Nûsra daku bibe hêza serdar a yekê, wê şerê hevalbendên xwe bike; Dewleta Îslamî jî wê şerê xwe bi neyarên xwe yên kilesîk re berdewam bike, mîna Kurdan û hêzên nakokber ên din. Ji ber ku C.El Nusra û Da`işê her yek ji wan pirojeyeke xwe ye taybet heye di ber de dixebite. Sazûman û Kurd jî wê li cihên xwe bimînin, xwe biparêzin û li benda guhertinên helwestên navdewletî bin.

### Qeyran û civaka navnetewî

Lê wekî ku xuya dibe, ev hemî renge[iĥtîmal] û gengazî ji hêla civaka navnetewî de wê ne tên qebûlikirin, û rewşeke wiha aloz ku rêxistinên têroristî tê de serdar bin, wê rêkê ji destêwerdaneke navnetewî ye ``rewa`` re veke û paşeroj û encam jî wê tam ne diyar bin, lê bê guman wê ji Sûryê re wek dewlet û ji gelê Sûryê re jî pir bi tirs û guman be.

Ji ber wê yekê, ji bilî ku şêwir û hevpeyvînên ku ji bo Cinêv III dibin bi ser kevin tu rê tuneye, loma jî pêwîst e hêzên navnetewî û yên têkildar, rojekê pêşde bigihîne wê baweriyê, û bibînin jî ku gerek e û erk e ku ``Belgenameya Cinêv I`` belkî li gel hinek guhertinan jî, were pejrandin, hukmeteke demkî, guhêzok[intîqal], tevahî, xudî biryar û bi hebûn an bê hebûna serê sazûmanê were qebûlkirin. Belkî bi wê yekê Sûryê ji vê tûnela tarî ku tê re diçe derkeve û pêvajoya serdemeke nû dest pê bike. Yan jî gemiya Sûryê wê bi hemiyan ve noq[ĝerq] bibe, kevir li ser kêvir namîne, û hemî nof, reng û pêkhateyên wê jî wê bi agirê şerê qirêj bişewitin.*

## AHENGÊN 15ê… Dûmahîk

**Xoybûnê** ya ku xebatkarê Kurd ê dilsoz **Mîr Celadet Bedirxan** yek ji hîmdarên wê bû hate damezrandin, û ji bo azadiya Kurdistanê, birayar bi rêveçûna serhildana Agirîyê bi serperiştiya ceneral **Ihsan Nûrî Paşa** dabû. Lê mixabin, piştî çar salan ji ceng û têkoşînê, li Çiriya Pêşîn a sala 1930, bi alîkariya Îranê, ew li ser destê dewleta Tirk têk çûye, û serokê wê yê hêja **Ihsan Paşa**, ta dawiya temenê xwe (25.03.1976) li Îranê derbeder û penaber maye. ''......*Piştî şikesinta serhildana Agiriyê, rijîma kemalîst zêde kefxweş bûbû. Di rojnameya* ***''Cumhuriyetê*** *'' de, di karîkatûrekî de, çiyayê* ***Agiriyê*** *weke goristanekê nîşan dabû, û ev çend gotin li ser nivîsandibû:*

***(Kurdistana ku we xeyal dikir li vê derê binax e.)!..''(2).***

Helbeatvan Nûşîn Bêcirmanî, Zahid Xelef, Serdar, Fewaz Osê û keça Kurd a 8 salî Jîn Bedir jî, bi helbestên xwe yên şêrîn aheng xemilandin.

Li dawiyê, pêşkêşkera ahengê, rêzdar Emel Ettê, spasiya beşdarbûna mêvanan kir û Cejna Zimanê Kurdî bi dilekî xweş û geş derbas bû.

# Birûska Pîrozbahiyê ji HDPê re

*Bi boneya serketina mezin ya partiya Gelan a Demokrat di hilbijartinên Tirkiyê de bi dest xist. Sekretêrê Partiya me PYDKS birûkek pîrozbahiyê ji serokê partiya HDPê re şand, ev e deqa wê.*

## Pîrozname

**Ji serokatiya Partiya Gelan a Demokrat HDP-ê re …**

**Berêz Selahiddîn Demirtaî …**

**Silav û Rêz…**

Ji dil û can, em serkeftina dîrokî ya ku we di hilbijartinên parlementeriya Turkiyê de pêk aniye pîroz dikin, û ji hemî dost, piîtgir û hevalbendên partiya we re li seranserî Turkiyê û Kurdistanê, şahî û pêşketinê dixwazin.

Bawerî li cî ye, ku têkoşîn û rola partiya we HDP her dê li pêş be, û di xizmeta doza aştî, azadî û wekheviyê de be.

Silav û pîrozbahiyên hemî dost, endam û rêxistinên partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê ji we re hene, û dibînin ku şahiya we şahiya me ye.

Bimînin di xweşiyê de

*Dîrok: Efrîn 09. 06. 2015.*

**Birayê we**

**Mihiddîn Şêx Allî**

**Sekretêrê Partiya Yekîtî ya**

**Demokrat a Kurd li Sûriyê**

# Mirovperwera Kurd Nehber ŞAHÎN

**Hevpeyvîn: Arif Hiso**

Jina Kurd bi sinc û mirovperweriya xwe naskirî ye, di heman demê de jî li kêleka mêrê Kurd di hemû warên jiyanê de xwe nedaye paş, nemaze dema ku rewşên kambax û xirab di ser civaka Kurdî de tên, ew bi hemû kanîna xwe li ber xwe dide, û ta jê tê dike. Lê hin ji wan jinan karine pir hêja di ber miletê xwe de dikin, hêja ye ku ew û xebata wan a payebilind ji gel re were berçavkirin. Yek ji wan jinên leheng **Nehber** xanim e.

Dema çeteyên Da`îşa terorist êrêş bajarê Kobanê kirin û xelkê Kobanê neçar bûn ku berê xwe bidin bakurê Kurdistanê, nemaze devera Sirûcê. Tabloya wê



koçberî û penaberiyê tev rengên dilêşî û xemgîniyê bûn. Ji aliyekî ve, zarok, jin, pîrejin û pîremêr li kolanên bajar û bajarokên navça Sirûc û derdora wê bê cîwar mabûn, û ji aliyekî din ve, birçîbûn, nexweşî û sermayê rewşa wan penaberan xerabtir dikir. Li bajarê Sirûcê **Nehber xanim** bi roj û şev li kolanên bajêr digeriya û penaberên Kobanê dixistin otombîlan, ew bi cîwar dikirin û hemû pêdiviyên jiyana rojane ji wan re peyda dikirin. Belê … Nehber xanimê derdora sed malbatî ji penaberên Kobanê, bi pereyên xwe yên taybet bi cîwar kirin û ji wan re pêdiviyên jiyanê pêşkêş kirin.

Li bajarê Sirûcê em bûn mîvanê Nehber xanim, û me ev hevpeyvîna bi wê re kir.

Nehber Xanim; di pêşî de pêşwaziya wê cihê rêzgirtina me ye.

**Pirs**: Nehber Xanim; tu dikarî xwe bidî nasîn?

**Bersiv**: Win bi xêr hatin. Li ser çavan. Navê min Nehber Şahîn e. Di sala 1955an de, ... ⓫

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de

Êmêla Newrozê:
Newroz@yek-dem.com